Çend Helbestên Sava


Fedwa Gêlanî

Ger tu nebî

ger çavên te nebin
dê çi li axê hêtin?
ger evîna min birawestêt
dê çi li gerdûnê hêtin?
Di hêlên jiyana xwe de te vedişêrim…
wek xunava nêrgiza
mina av û agirî
tu yî gola agirî
bi xunava nêrgiza û te,
mijûl im…
di xeyala xwe de te heldigrim ...
di taristanê de kûr diçim….
nêrgizeka zer û gola agirî dibirsq im

Ger tu nebî

Ez, tu û şev

Li ser pêjanên jîna min
deng û esman
têkel dibin…
serê min dibîte dihol…!
Li ser hêlên rojên min

digeviz im…
hest bi xerîbiyê dikim
hest bi tariyê û te dikim….
te nabînim
ji evîna xwe dûr dikevim
da razîbim..
li jêr balîfka,
serê xwe vedişêr im…
da kesî nebînim
tu nebî...!
Bi tenê me wek
tewalekî di zindana şevê de
xemgînim wek çavên
ez tê de .

Welat

Tarî ye...
bêdengî ye...
lê ji bilî
li gel te û bêyî te
bê cih û war im
bê buha me...
bê evîna te
mirî me ey welat.

Ez, tu û şev
Welat